

Fermana "49"an Kula ser kulan...!!!

Rêberê Silivî

Tevî ku piraniya salên me Kurdan tal û ne xweş in, ji ber ku ew bi kul, derd û êş di ser me re derbas dibin. Lê belê, sala 2008an, di dîroka gelê me yê Kurd de li Sûriyê, bi gelamper û ya xelkên me yê **Cizîrê** bi taybetî, saleke reş, çift û bê qidoş e...!!!

Di welatê me **Sûriyê** de, **Devera Cizîrê** maka xêr û bêr û çandiniyê ye. Ji ber ku, ji hêlekê ve xaka wê têr û zengîn e, û ji hêla din ve, li zivistanan, berf û baraneke giran dikeve, Buhareke xweş û gulgulîn bi şûn xwe ve tîne, û xweşî û bextiyariyê bi ser xelkên wê de dirijîne. Lê mixabin, sala 2008an, saleke hişk û ziwa bû, genim, ceh, nok û nîskan kat nedan û ew di bin axa xwe de mirin. Gelş û geya jî li bender, best û hewîngan şîn nehat, pez, sewal û dewar jî, ji ber tunebûna çêrê birçî û sifil bûn. Ji neçarî û tunebûna êm, gundiyan ew firotin, di gundên xwe de, ew bê mast û sipî man...Bi kurtî, mirov dikare bibêje ku di vê salê de, xelkên devera Cizîrê bi Ereb, Kurd, Asûr û Ermenên xwe ve, ketine destengî û astengiyeke aborî ya dijwar ...

Li şûna ku destelata Sûriyê destê alîkarî û yarmetiyê dirêjî welatîyên xwe bike, bi hawar û gaziya wan ve here, derd û kulên wan sivik bike; Ew bi du kiryarên pir xirab rabûye û ben li stuyê wan tengtir kiriye, ew jî ev in:

1- Wê buhayê firotina "Mazotê"

3 qatan bilind kiriye, û buhayê hemî meteryalan "Mewadan -şênberan" pêre giran bûye.

2- Wê fermaneke nijadprest malwêrane dijî gelê Sûriyê derxistiye. Li gora vê fermanê, mirovê Sûriyê di kirîna xanî, milk, dikan û xaka çandiniyê de ne mafdar e...!!! Ango, eger hat û mirovekî xaniyek ji xwe û zarokên xwe re li deverekê kirî, li gora vê fermanê, ew xanî li nik dewletê, li ser navê wî qeyd nabe...!!!

Ji ber vê fermana tixumperest, karê avakirina avahiyan di deverên ku ew ferman lê tê mişandin de bi yek carê hate rawestan, ziyaneke mezin gihişte jiyana xelkê, bêkarî, xizanî û perîşaniyê li her cih û warî konên xwe yê reş vegirtin, û şîn kete her malekê ji wan deveran . Di encam jî de, ji dest rebenî û neçariyê, gelek malbatên Kurdan gundên xwe, xaka bav û bapîrên xwe berdane, li derdora bajarê Şamê cîwar bûne û hin ji wan jî, li derveyî welêt, li biyaniyê penaber bûne...

Mixabin, ku di rewşeke wiha de ku gelê me yê Kurd li Sûriyê bi agirê şovenizmê tê birajtin, ketiye ber şek û pekan û ji ber pîlanên zikreşan dikale û dinale, û rehên wî ji kokê ve tîne birîn. Ê tevgera me ya netewî aya Kurd bi hilwesteke ne berpirsiyar têtikiliyê bi vê dozê re dike û tiştê jê tê xwestin nake. Wê piştî xwe

D.R.(9)

***Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê
Kurd re yê di girtîgehên Sûriyê de***